

Civîna 66an ya Kurmancî

Ev ji du salan zêdetir bû ku civîna Kurmancî ji ber sedemên pandemiyê nehatibû li dar xistin. Pandemiyê malwêran, ji bilî ku gelek ezîzên ber dilê me ji me standin, bû sedemên gelek alozîyên cihanî û deverî jî. Vê malkambaxê hevalê me yê delal, gula civîn û civata me kek Hemîd Kiliçaslan jî ji me stand û berê wî da oxira dawîn. Wî bi rastî dilê me hemûyan sot û tê de birîneke kûr vekir. Bila berî her tiştî serê malbat û mermalên wî û yê me hemûyan sax be, sebir û metanet para me hemûyan be. Bila dilovanîya Xwedê li ser be û cihê wî behîşt be.

Me ev civîn wek civîneke ne fizîkî, lê bi rêya Înternetê saz kir. Ji ber hindê ev ji bo me bû civîneke serbûyerî. Me ew di roja 30.10.2021ê de da dest pê kirin û piştî mehekê qedand. Sedemê evçend dirêjbûna civînê bi derfetên hevalan ve girêdayî bû. Me bala xwe dida wextên wan û civîn li gor wê şev yan jî roj li dar dixistin.

Vê carê me li ser babetên xwe yê nivçih mayî yê wek Peyvên kêmnas – nenas,

Peyvên kêmnas – nenas yê Behdînan, Peyvên ji pirtûka Zargotina Kurda û pirtûka Nameyek ji Şirnexê, herweha hindê babetên nû yê wek Ferhenga kurdîya Xorasanê, Navên hin gul û gîyayên Kotolê, Ferhenga govendên Kurdan û Mamikên kurdên hêla Batmanê kar kir.

Bi sayeya ev hevalên beşdar ev berhemên jêrîn hatin bi dest xistin.

Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Michael Chayet (Waşington), Omîdê Mistefayê Celalî (Bazîd), Lezgîne Çalî (Barzan), Newzad Hirorî (Dihok), Mehdî Jaferzadeh (Xorasan), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Selam Nûman (Qamişlo), Fadil Omer (Dihok), Zinar Soran (Dêrik), Behrûz Şucaî (Kotol), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

Hindek peyvên kêmnas yê Behdînan

- II -

Amadekar: Lezgîne ÇALÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
koç; kolkedar, kutik, qoc	odun kütüğü	souche d'un arbre	baulk
koser; kujiyê dîwarî ji aliyê derve	dış köşe	coin extérieur	outer corner
kulok; xembar, aciz	dertli, üzgün	triste, affligé	dreary, glum
kwî; kinîşt, kêvjik, şîlaq	çapak	chassie	eye mucus
larba	ön satış	prévente	sell in advance
larbayî kirin	önceden satmak	vendre d'avance	to sell in advance
layik; lalî, sênîk	yemek tabağı	assiette, plat	plate, dish
lebik	kaygılı	soucieux, inquiet	worried, apprehended
levd; firrek, firake	uçurum	abîme	cliff
malîte	sinçap deliği	trou d'écureuil	squirrel hole
mar; hesûd	kıskanç	jaloux	jealous
marî; hesûdî	kıskançlık	jalousie	jealousy
mejkod(i)k	kafatası	crâne	cranium
mekeb	bnr > merkeb		
meriçîn; miriçîn, pilçiçîn, pelçiçîn	ezilmek	s'écraser, être écrasé, être forcé	to be crushed, pressed, smashed, squashed (insects, soft fruit)
meriçandin; miriçandin, pilçiçandin, perçiçandin	ezmek	écraser, presser, fouler	to crush, press, smash, squash, squeeze
meşkolk; mişkûlk	gözkapağı	paupière	eyelid
basik; bask	sigara ağızlığı	fume-cigarette	cigarette holder
muhl/ mol: (min mola xwe daye wê)	meyl	penchant, tendance	tendency
mukir; herimî, pîs	berbat, adi	souillé, sale	dirty, wicked
nîlan; ciwan, bedew	güzel	beau, joli	pretty, beautiful
nîpîtin; nivistin	uyumak	dormir	to sleep
panîkêş; kevçiyê solan	kerata, çekecek	chausse-pied	shoehorn
pejinîn	ağaçların kurumuş dallarını kesmek	élaguer les branches mortes	to trim dead branches of a tree or a log
pêkijîn; bêhnişîn, bêhnijîn	hapşırma	éternuer	to sneeze
pelix; sak, gedek	manda yavrusu	buffletin	buffalo calf
pelpîs	eğik, yamuk	oblique	oblique
pengurre	çer çöpün bir derede oluşturduğu tikanıklık	engorgement d'un cours d'eau par des détritiques	blockade of a stream with dead branches and leaves
pereş	posa	résidu	pulp
perpûn	aşı	vaccin	vaccine
pêrm	ihmal edilmiş	négligé	neglected
pêrm kirin	ihmal etmek	négliger	to neglect
pêrm bûn	ihmal olmak	être négligé	to be neglected
perweste bûn: <perwesteyê xudê bûm>	mütevesil olmak	implorer, supplier	to implore, invoke, beg
pêwestan: <ez bi te nawestim>: ez bi te nikarim	edebilmek, yapabilmek	pouvoir, être à même de	to be able to
pinto: pîs, pintî	pis, kirli	malpropre, sale	dirty, filthy
piriskîn: turiskîn	defolmak	ficher le camp	to clear out, go away!
tîrgar, tasa avê	tas	bol	bowl
qebark; kivark, karok	mantar	champignon	mushroom
qelaztin: xwe li ber venûsandin û hêdî bo çûn (pişikê xo qelaste mişkî)	pusuda beklemek	se tapir	to stalk
qeloş	iflas etmiş, müflis	ruiné	bankrupt

Hin peyvên kêmnas – nenas

- XIII -

Amadekar: Reşo ZÎLAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
kevîrxwê	kaya tuzu	sel de roche	rock salt
xudîk; xwedaketî, damayî: <dilê mino yê xudîk e>	ruhu sıklmış, çökmüş	déprimé, abattu	depressed
nihar; şîn: <dilê mino ji niharê>	yas	deuil	mourning
bijandin: belav kirin	dağıtmak	disperser	to disperse
armancanê	nişan alma oyunu	jeu de tir sur cible	target shooting contest
lêb; hîle: <van filan di gel me lêb e>	oyun, hile	tricherie	deceit, stealth, trickery
tan; perçîn, perjan, sênc: <şexxane lê bûne tan e>	çit	haie	hedge
gemirandin; gemarî kirin: <bigemirîne!>	kirlilmek	salir, souiller	to soil, make dirty
serhonaz; serekê kêlindîkêşan	tırpancı başı	faucheur en chef	head scythe wielder
teribandin: <seya pez diteriband>	bozmak, dağıtmak	dérégler, défaire, disperser	to break
heyseheys: <diketîne heyseheysa wî ku ka li kû maye>	merak, endişe duyma	souci, inquiétude	worry, concern, anxiety
pilitandin; lepitandin: <min nikarîbû ez pêçiyên xwe bipilitînim>	kımıldatmak, hareket ettirmek	bouger, remuer	to move
hinder: <tang, li hindera cihê ku>	hiza	ligne, rang, niveau	the same row, alignment
kumişîn	(üstüne) çökmek	se tapir, se blottir	to pounce on
çermilaq	cılız	maigrichon	very thin, scrawny, skinny
bêayîk	kusursuz, masum	innocent	innocent
çaw: werîsên bi gîhayê badayî hatîye çêkirin > bnr rîsî		botte de foin, tressée	
hemla xwe danîn	doğum yapmak	accoucher, donner naissance, enfanter	to give birth
keleske	at arabası	chariot à cheval	horse carriage
kîs kirin: hêz/ hoz kirin, koz kirin	kuzuları koyunlardan ayırmak	séparer les agneaux des brebis	separating lambs from sheep
mîta: mîna	gibi	comme	as, like
heşîrî bûn: <ez heşîrî bûm>: =ez ji hiş ketim/ gêj bûm	sersemleşmek	s'étourdir, devenir étourdi	to get dizzy
te'î dan; pêl dan, têt dan, tal dan	itmek	pousser	to push
lênd: bistanên çêlekan	inek memesi	pis de vache	udder
mêreg; mereg, kadîn	samanlık	grange à foin	hayloft
ecer; nû	yeni	nouveau	new
biskurînewe: şekirina hirîyê	yün taramak	peigner (laine)	to comb wool
arpîyok; bêjînga arî/ ard	un eleği	tamis à farine	flour sieve
baçore: kesê bêçineyî diaxive, lewçe, geveze	boş boş konuşan, geveze	bavard, moulin à paroles	one who talks nonsense, talks gibberish
gareş; çêlek – ga – gamêş- madek:	büyükbaş hayvan	bovin	cattle, bovines
bacî; stran:	şarkı	chanson	song
lê niştin; siwar bûn	binmek	monter	to get on
apince	palto	manteau	overcoat
bidî: şahid, biçavdî	şahit	témoin	witness
palûn	kadın uçkuru	braguette d'un sous-vêtement féminin	drawstring for women's under garments
coban: werîsê pê gîya û sap bi firxûnê ve girê didin	yük bağlamada kullanılan organ	grosse corde en poils de chèvre utilisée pour fixer des bottes de foin sur une charrette à bœuf ou à cheval	rope for securing a load (on animal's back)
dargur; dargurd, gurd	gergi iplerini askıya alan değnek (dokuma tezgahında)	bretelle du canevas d'un métier à tisser traditionnel	wooden part of a carpet loom

Mamik û tiştanokên hêla Xerzan


Amadekar: NAROZÎ

1. zîq û zîq, heşt ling û du çîq	cot/ halet û herdu ga	15. lemê lem da, behrê kef da, masî hat û gumgum	çira
2. sindirûk li ser sindirûkê, nifte bi destê bûkê:	destar	di dev de	
3. diçim ser dîyarekî, dikutim bizmarekî, deng diçe hezarekî	gurîna ewran	16. tiştêkî min heye hima xweliyê li xwe dike	gîsin, gêsî, gasin
4. kumê hûtik, tije nûtik	hêjîr	17. bi kû ve diçim li dû min têt	sî, sîber
5. kumê xezalê, gêr bû newalê	botaf	18. hêstira qero li benderê, ne gur dixwe ne diz dibe	mîro, mîstranok
6. tendûra xumxumî, tije nanê genimî	esman û stêrk	19. darînok, şêrînok, guhbelok	mêw
7. şivterik li guherik/ şiva ter, li guher	mar	20. binî axîn e, nivî zilîn e, serî zêrîn e	genim
8. keçika bi kezî, li ser banan dibezî	dû	21. binî axîn e, nivî zilîn e, serî zîvîn e	ceh
9. heke meke, kevnîkek tije çek e ji Xwedê pêştir kas nikare veke	jina ducanî	22. heroj pînan li xwe dixwe	sêla nan
10. deve bi barê xwe ve diçe aş, lê dûvê wê naçe aş	dev û kevçî	23. ne li erd e, ne li esman e, hêlîna begrewan e	gun
11. qesra spî, bê derî	hêk	24. reş e reş e weke qîr, spî ye spî ye weke şîr	qijik
12. reş e reş e weke qîr, kutilkan çêdike weke jina mîr	kêzika gûgerîn	25. ji darê dikim hebek e, li erdê dixim hezarek e	hinar
13. li avê dixim dişikê, li tehtë dixim naşikê	kaxiz	29. dest dide qûnê dev ji hev diçe	meqes
14. li avê dixim naşikê, li tehtë dixim dişikê	hêk		


Çend gul û gihayên Gelîyê Kotolê

Bêhrûz ŞUCAÎ


kurdi	latîni	tirkî	fransizî	îngilîzî
jîre	<i>Carum carvi</i>	kimyon	carvi ou cumin des prés	cumin, caraway
xîtik	<i>Anthriscus sylvestris</i>	frenk maydanozu	cerfeuil sauvage ou cerfeuil des bois	cow parsley
tehlik	<i>Valeriana officinalis</i>	kedi otu	valériane officinale ou Valériane des collines	garden valerian
xwirnik	<i>Erodium cicutarium</i>	turnagagasi	bec-de-grue à feuilles de ciguë, érodium commun	redstem filaree
şetere	<i>Fumaria officinalis</i>	şahtere otu	fumeterre officinale ou Pied-de-Céline	earth smoke
pîjindar (bêjan, bêwîjan, gula mêş, gulikê, maran, pûjang)	<i>Achillea millefolium</i>	civanperçemi	achillée millefeuille	yarrow
pelghewêz (belghewês, belghevês, pelhewês)	<i>Plantago Major</i>	sinirli ot	grand plantain	broadleaf plantain, white man's foot, greater plantain
kulîlka pêner	<i>Ranunculus acris</i>	acı düğünçeği	renoncule âcre ou bouton d'or	meadow buttercup
çehvîşinok	<i>Lepidium draba</i>	yabani tere	brocoli sauvage	whitetop, hoary cress, thanet
sêbiske	<i>Tulipa Agenensis</i>	kaba lale	tulipe d'Agen	eyed tulip
şivsork	<i>Artemisia vulgaris</i>	bayağı yavşan	armoise commune ou armoise citronnelle	common mugwort
elegez	<i>Puschkinia Scilloides</i>	karsümbülü	squill rayé ou squill du Liban	striped squill lebanon squill



jîre
Carum carvi



xîtik
Anthriscus sylvestris



tehlik
Valeriana officinalis



xwirnik
Erodium cicutarium




şetere
Fumaria officinalis



pîjindar (bêjan, bêwîjan, gula mêş, gulikê, maran, pûjang)
Achillea millefolium



pelghewêz (belghewêz, belghevêz, pelhewêz)
Plantago Major



kulîlka pêner
Ranunculus acris



çehvîşinok
Lepidium draba



sêbiske
Tulipa Agenensis



şivsork
Artemisia vulgaris



elegez
Puschkinia Scilloides

Ferhengoka govendên Kurdan

Amadekar: Michael L. CHAYET
bi alîkarîya Arjen BRÛSK û Reşo ZÎLAN

Navên govendan:

Bablekan (Lûtik; Meyroke; Rişko)	Dûz (Dik halayı)	Lorkê	Şer e - Serhed
Bagîye - Qamişlok	Ekmelî - Êrmiye heta Kotolê	Lûtik (Bablekan) - Behdînan	Şewqo (Dûzo)
Bêlûte/Bêlimte - Farqîn, Bidlîs, Şîrnex	'Elo Dîno	Meyroke (Bablekan)	Şêrêzdîn
Bêrîyokê - Behdînan	Eyşokê - Mûş	Milanê - Hekarî, Behdînan	Şêxanî - Hekarî û Şîrnex, Behdînan
Cirîd - Serhed	Gerdûn - Silêmanî, Kerkûk	Narê - Gelîyê Kotolê	Tenzere/Tamzara (Romanî) - Serhed
Çargeh (Delîlo)	Giranî	Papûrê - Bidlîs	Teymez (Hespê Begzade) - Hekarî
Çeçenê - Qamişlok	Harkuşta	Qilîçik - Rewan (Erevan)	Têmurê Axa (Temîlav) - Wan, Bazîd
Çepik - Hekarî, Bilîs, Dîyarbekir, 'Entab,	Êharranî	Qutkê - Bohtan	Tilmercan - Behdînan
Semsûr, Riha	Hejîrok (Şemame)	Reyhanî - Mêrdîn	Til[y]anê - Zaxo
Çepî (Çopî) - Silêmanî, Kerkûk	Êhelebî	Rişko (Bablekan)	Wer Xanê - Cizîra Bohtan
Çepkî - Mûş/Varto	Helpekerke - Govendên Soranîxêvan	Romanî (Tenzere) - Serhed	Xanim
Çirtequlî	Hespê Begzade (Teymez) - Hekarî	Sêgavî (Delîlo)	Mîrî - Kerkûk
Çopî (Çepî) - Silêmanî, Kerkûk	Hûrizî - Mêrdîn, Qamişlok	Sêpêyî - Silêmanî, Kerkûk	Xelef im
Delîlo (Çargeh; Sêgavî)	Keleşo (Govenda Şoreşgeran)	Simsimî	Xirfanî (Xurpanî) - Mêrdîn, Qamişlok
Di Cî de (Cîda)	Keşeo/Keşewo - Dîyarbakir 1	Simson??	Ûzeranî - Bidlîs
Duniğî (Koçerî) - Riha	Koçerî (Duniğî) - Erzirom	Şamîran - Şîrnex (Goyî)	Zîvgiro - Mûş
Dondîrxan	Kurmancî - Qamişlok	Şemame - Hekarî û Şîrnex	Zozan

Termînolojîya (peyvazîya) govendgêrîyê:

kurdî	tirkî	fransîzî	ingilîzî
cergebez = reşbelek	kadınların ve erkeklerin yan yana olduğu dans	hommes et femmes dansant côte à côte sur une même ligne de danse	men and women dancing side by side in one dance line
çerik = dîrikên dawetan, dîlok, dîlanok, stranên dawetan	halay türkûleri	chanson de danse, air de danse	dance song
çok şkandin	halayda diz bükme	plier son genou (dans la danse)	to bend one's knee (in dancing) 2
dawet	düğün, düğün halayı	1) fête de mariage, 2) danse collective accompagnée de musique et de chants, ronde	1) wedding festivities; 2) dance dîlan (dîlok, dîlanok) folk dance & accompanying folk song rabûn dîlanê (Kotol) to dance govend folk dance
govend girtin	halay çekmek	danser (dans une ronde)	to dance
ketin govendê	halaya katılmak	entrer dans la danse	to join the dance
govendgêr	halay çeken	danseur (de danses populaires)	dancer, folk dancer
govend ge'randin	halayı döndürmek	faire tourner la danse	to lead a dance
sergovend = serçopî, serçemk (Behdînî)	halay başı	meneur de la danse	leader of the dance
serê govendê kişandin	halay başı olmak	mener la danse (à la tête d'une ronde)	to lead the dance
binçemk (Behdînan)	halayın sonundaki dansçı	danseur qui ferme le rang	dancer at end of the line
vege'randin/li hev du ge'randin	solistin söylemekte olduğu şarkıya aynı dizeleri tekrarlı eşlik ederek cevap vermek,	reprendre la chanson du chanteur principal dans les chants alternés qui accompagnent les danses populaires	to sing and respond (the leader sings one verse, then the other dancers respond by repeating the same verse; this give and take is repeated for each verse)

Amûrên mûzîkî yên govendan:

kurdî	tirkî	fransîzî	ingilîzî
balaban: dîdik, pîzpîzk	balaban	genre de clarinette, instrument à vent de la musique populaire kurde	flute-like woodwind instrument
bilûr	kaval	flûte de berger	shepherd's flute, end-blown flute
def û zirne, dihol û zirne	davul zurna	grosse caisse et zirne (instrument à vent à embouchure au tube évasé)	drum and zurna (reed wind instrument)
'erbane, def	erbane	tambourin à une peau	tambourine
kemançe	kemençe	vielle à pique à trois ou quatre cordes	string instrument, similar to fiddle
klarnet (qîrnete)	klarnet, gîrnata	clarinette	clarinet
ney	ney	flûte de roseau, pipeau	Turkish name for balaban
rebab, ribab	rebap	instrument à archet à trois cordes et une caisse à résonance en noix de coco	string instrument with one string
tembûr	tambur	tambur, luth à long manche et six cordes pincées	string instrument, similar to Turkish saz 3

Peyvên ji Zargotina Kurdan (III)

Amadekar: Zinar SORAN

kurdî	tirkî	fransîzî	ingilîzî
kinyazî: mîranî	beyce	princièremant	princely
nanxur	emir kulu	serviteur, qui est à la charge de qqn	servant, stipendiary, aide
qeter; qetre	göz alabildiğince	aussi loin que l'œil peut voir	as far as eye can reach
<hindî çav qetre dîke>			
çilvilîn	ışıldamak, parlamak	briller, scintiller	to sparkle, to scintillate
xişûş	nazik	délicat	nice, delicate
hêzing	iç çekme	soupir	sigh
bayîs	sebep	cause	cause
çarnîçik; çarkenar	dörtköşe	rectangulaire	fourcorner, rectangular
dolavrêş; dolabrêş	çıkırkçı (dokuma)	fileuse	spinning wheel worker
bane	mandıra	ferme	dairy
tofil, toqil: tivil	soğan zarı	membrane d'oignon, pelure	membrane of onion
hîva kêrr	hilal	croissant	crescent
qotik	püskül	pompon	tassel
delme	etek	jupe	skirt
solmest	ayağında mes olan	qui porte des chaussettes à semelle de cuir	person wearing inner shoes
mest	mes	chaussettes à semelle de cuir	inner shoe
vir û viz	yalan dolan	bobards	monkey business

Kurdîya Xorasanê (I)

Amadekar: Mehdî JAFARZADEH

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
A			
acirix, zeîf û lawaz	zayıf, cılız	maigre, faible	weak, feeble
aciz, zirav, ne stûr, ne qalind, zeîf, nazik, tenik.	ince	mince, fin	thin, slim
acîw, sitemkêş	mazlum	opprimé	oppressed
afirnifir, nifir	beddua,	malédiction, anathème	curse
aftefe, misîn	ibrik	aiguère	ewer
ajnî, avjenî	yüzme	nage, natation	swimming
aldîn, dê û bav	ebeveyn	parents	parent
alebilût, reşûspî	alaca	pie	tawny, pied
alçix, sîstema bi deyndana şîr ya du cînanan, dema ku şîrê pez û dewarên gund kê mibe, gundî li hev dikin ku her roj şîrê hemû gund yan çend malan bidin malbatekê û ev deyndan bi dorê digere di nava cînanan da; deynkirin û deyndana şîrî bi dor	köylerde sırayla süt borç alma / verme	système de prêt de lait entre voisins lorsque le bétail ne donne pas assez de lait, les paysans s'organisent pour donner à tour de rôle chaque jour toute la production du lait d'un village à une famille	system of lending milk between neighbors when the livestock does not provide enough milk, the farmers are organized to distribute all the milk production of the village to a certain family each day
alçix kirin	köylerde sırayla süt borç almak / vermek	prêter du lait entre voisins d'un village	milk exchange between neighbors
aliş kirin, guhertin	değiştirmek	changer	to change
alli, êşa didanan ji ber xwarina tiştên tirş, hal, kuh, koh, hilû	kamaşmak (diş)	agacement (dent), sensibilité (dent)	dazzle (tooth)
alûbixare, alûyên hişkîrî	kurutulmuş erik	prune séchée	dry prune
alûçe, gîyayeka wek maqarneyê ye ku li ser darên din dişide û wan pûç dike	küsküt, bağbozan, cuscute spp	cuscute	dodder
alxur, serhildayî, kesê ku li hember her tiştî ye	asi	rebelle	rebellious
amixte, amuxte, li kesek yan tişteke adet kirin. hînî kesekê / î bûn	alışkın, münis	habitué à quelque chose ou à quelque chose	accustomed, being used to something / someone
aramçî, navbeynkarî kirin, ji hev cuda kirin	ortaliği yatıştıran	médiateur, arbitre	arbitrator, mediator
aramkîne, (r) bi aramî, hêdî hêdî.	yavaşça, sakince	doucement, calmement	slowly, gently, calmly
ardane, golikên ku ji şîr ve hatine kirin, êdî şîr naxwin	sütten kesilmiş buzağı	veau sevré	weaned calf
arelenav, yekdermîyan	her ikiden bir	un sur deux	every other one
arîg, qerisîn û nexweşîya ji ber sermayê	üşütme	refroidissement	to catch cold
arpeşk, nearam, ne sakîn	ateş parçası, yaramaz	turbulent, tumultueux	naughty
aşne, dost, heval	arkadaş, aşina	ami, pote	friend, buddy
atile kirin, cuda kirin	ayırarak	séparer	to separate
avekî, tiştên avek	sıvı	liquide	liquid
avgerdan, melaqeya mezin	kepçe	louche	ladle
avgerm, kanîya ava germ	kaplıca	eau thermale	thermal springs
avgoşt, şorbeya goştî	bir türlü et haşlama	bouillon de viande	meat stew from Khurasan
avkêsk: avkîsk: avkişandî û nemgirtî	su çekmiş	trempe, mouillé	soaked
avrêj, cihê ku ava baranê têda diherike û digihêje newalan	su yolu, su akıntısı	rigole	watercourse
avrumend, xwedî avrû	şerefli, onurlu	honorable	honorable, respectable
av reşîn, av pijiqandin	su serpmek	asperger de l'eau	to sprinkle water
avxurî: avxor, stikan, pîyale	bardak	verre à eau	glass
avzîpo: 1. çaya zêde zelal / kêmrang, 2. şorbeya ron	çok açık, sulu	1) thé léger, 2) soupe claire	very light
awadan: avedan, ava	bayındır	prospère	prosperous, flourishing
awandin: dewisandin, hepişandin, ebandin	tıka basa doldurmak	entasser, tasser, remplir à bord	to cram, stuff
awarde, bêzar	bezgin, bezmiş	à bout, exténué	harass, sick and tired, fed up with
awarde kirin, bêzar kirin	bezdirmek	harceler, importuner, mettre à bout	to harass, sick and tired, fed up with
awat, bi ber	verimli	fertile	fertile (land)
awirdan, mirûzdan, rûyê xwe tirş û tal kirin	asık suratla bakmak	jeter un regard sévère	to pout, scowl, make a face
axir: afir	yemlik	mangeoire, auge	trough
axzûn,	azgın	enragé, agressif	aggressive, furious
axirbarî / axirkişt / axirpişt = binhenban, binhêlînk, paşlandik:	son beşik (çocuk)	dernier-né	youngest child
axirbend: dermale, dabestî: pez û dewarên ku li malê li ber axiran dihên xwedîkirin	besi hayvanı	bête engraisée	domestic cattle and sheep fattened for slaughter, fatling
axirîk, axirî	sonunda	à la fin, finalement	at last, lastly, finally
axiş, yûnceya çinandî ya ku li ber tavê hatî raxistin bo zuhabûnê	kurutulmaya bırakılmış yonca / ot	foin étalé au soleil pour sécher	clover and other grass left out to dry in the sun
ayîş, neçandina û istirahetdana zevîyê	nadas	jachère	fallowing field
azirde 1. nexweş, nerahet, 2.	1. hasta, 2. doğuştan engelli	1) malade, 2) handicapé (de naissance)	1. Sick, ill, 2. disabled (from birth)

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information

© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org

Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN